# MUZÎK

## SERETAYÎ

## 4

2019/2020

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Muzîkê ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

**- Komîteya Şopandinê**

**- Komîteya Fotoşopê**

**- Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


PILEYÊN MUZÎKÎ ........ 7
PILE Û TEŞEYÊN MUZÎKÎ ........ 8
NOTEYA MUZÎKÎ ........ 10
STRANA KÎROŞKÊ ........ 11
XANEYÊN MUZÎKÊ ........ 12
NÎŞANEYÊN BÊDENGIYÊ ........ 14
STRANA AY LÊ NÛRÊ ........ 15
TENBÛR ........ 16
TERAZÛYA MUZÎKÎ 1 ........ 17
TERAZÛYA MUZÎKÎ 2 ........ 19
KOMA MUZÎKÎ 1 ........ 21
RAHÊNANA SOLFAYÎ 1 ........ 22
PILEYÊN XALDAR ........ 23
RAHÊNANA SOLFAYÎ 2 ........ 25
ARAM DÎKRAN ........ 26
STRANA BÛKÊ DELALÊ ........ 28
DABEŞKIRINA AMÛRÊN MUZÎKÊ ........ 29
RAHÊNANA SOLFAYÎ 3 ........ 30
BIZIQ ........ 31
AMÛRÊN MUZÎKÎ ........ 32
AWAZÊN MUZÎKÎ ........ 34
KOMA MUZÎKÎ 2 ........ 35
MERYEM XAN ........ 36
STRANA AYŞOKÊ ........ 37
JI FOLKLORA ME ........ 38

Wane 1

# PILEYÊN MUZÎKÎ


❖ Em pileyên muzîkî ji jêr berbijor ve bixwînin:

Do – Rê – Mî – Fa – Sol – La – Sî



❖ Em pileyên muzîkî ji jor berbijêr ve bixwînin:

Do – Rê – Mî – Fa – Sol – La – Sî



Wane 2


# PILE Û TEŞEYÊN MUZÎKÎ

❖ Em bibîr bînin ku pileyên muzîkî **7** pile ne:

Do – Rê – Mî – Fa – Sol – La – Sî



## Teşeyên pileyên muzîkî:

Nîşaneya pileya yek 


Nîşaneya pileya spî 

Nîşaneya pileya reş 


1. **Pileya yekparê:** Mezintirîn pileya muzîkî ye û di çar deman de bi bilêvkirin "Ta"`yê tê xwendin.



2. **Pileya spî:** Duyemîn pileya piştî yekparê ye û di du deman de bi bilêvkirina "Ta"`yê tê xwendin.



3. **Pileya reş:** Sêyemîn pile ye û di demekê de bi bilêvkirina "Ta"`yê tê xwendin.



Wane 3

# NOTEYA MUZÎKÎ

- Ka em bi hev re vê noteyê bixwînin.
- Ez bi xwendineke rîtmî, noteyê bixwînim.
- Ez bi xwendina solfayî, noteyê bixwînim.
- Ka em bi hev re rahênanê bikomî dubare bikin û terazûya pêlekanê di ber çavan re derbas bikin.



# STRANA KÎROŞKÊ

❖ Li gorî noteya muzîkê, em bi hev re vê stranê bistrên:




Kîroşka me ya delal
Diçe derve nayê mal
Pir ji derve hez dike
Ser giyê yarî dike

Diqevize û çendike
Gêzer dixwe û bêhn dike
Kîroşka me ya delal
Diçe derve nayê mal

Gava nêçîrvan dibîne
Zû ji wir xwe vedikişîne
Xwe li nav dara vedişêre
Li aliyê wî nanêre
Kîroşka me ya delal
Diçe derve nayê mal



Cegerxwîn


# XANEYÊN MUZÎKÊ

**Xaneya muzîkê**: Ew alava pîvana deman e û rîtmeke ku awaz di hindirê wê de tên nîgarkirin.

Dibe ku ev xane di nava xwe de **4** deman bigire û bi navê **"xaneya 4 demî"** tê pênasekirin, dibe ku **3`ê** deman bigire û bi navê **"xaneya 3`ê demî"** tê pênasekirin û dibe jî **2** deman bigire û bi navê **"xaneya 2 demî"** bê pênasekirin.

Ji vê jî em têdigihêjin ku xaneyên muzîkê ji deman pêk tên û di destnîşankirina dirêjbûna muzîkê de tê bikaranîn û bikaranîna wan di nîgarkirina awazan de pir girîng e. Û bi rêkûpêk li ser pêlekana muzîkê li dûv hev tên nîgarkirin û di navbera wan de mîna xêzeke stûnî ku bi navê **"xêzika xaneyê"** tê naskirin, heye.

Hevoka biawaz ji çend xaneyan pêk tê û di dawiya wê de cotexêzek heye ku bidawîbûna awazê diyar dike.






Kilîlka sol
Xaneya çardemkî
4
4
Dûmahîka xaneyê
Dûmahîka hevoka biawaz

Wane 6

# NÎŞANEYÊN BÊDENGIYÊ

Nîşaneyên bêdengiyê: Ji her pileyeke muzîkî re, nîşaneyeke bêdengiyê heye û di heman dema pileyê de tê rawestandin.

| Teşeya pileya muzîkê | Teşeya nîşaneya bêdengiyê |
|---|---|
| Pileya Yekpar  |  |
| Pileya Spî  |  |
| Pileya Reş  |   |



Wane 7

# STRANA AY LÊ NÛRÊ

❖ Li gorî noteya muzîkê em bi hev re û bi yekdengî vê stranê bi mamosteyê xwe re bistrên:




Ay lê Nûrê lê Nûrê zalim Nûrê
Ay lê Nûrê lê Nûrê xayin Nûrê
Ziravê bê qusûrê lê lê Nûrê
Xelka welatê dêrê zalim Nûrê
Barê Nûrê titûn e lê lê Nûrê
Du kolciya girtine zalim Nûrê
Birin sara mezin e lê lê Nûrê
Eywax eywax li min e zalim Nûrê
Malê Taho mêstine lê lê Nûrê
Malê Taho mêstine lê lê Nûrê

Dîkê sibê distire lê lê Nûrê
Nûrê tê tu digîrî zalim Nûrê
Go çima Nûrê tu digîrî lê lê Nûrê
Kolciya mala min biri zalim Nûrê
Go çima Nûrê tu digîrî lê lê Nûrê
Xelkê malê min birî zalim Nûrê


Gelêrî

Wane 8

# TENBÛR

Tenbûr: Amûreke muzîkê ya bitêl e, ji demên kevin ve tê bikaranîn; bi piranî di nava gelê Kurd de herî zêde tê bikaranîn. Bi têl û destikekî dirêj e; heft têlên wê hene.

Li gorî teknîka lêdana tenbûrê; bi mizrab, an jî bi tiliyan tê lêdan. Tenbûr, piranî ji darên tû û berûyê tên çêkirin, lê ji dara gûzê jî çêdibin.



Wane 9

# TERAZÛYA MUZÎKÎ 1


**Terazûya muzîkî:** Ew rênîşandana qutkirin û belavkirina dema muzîkê ye, birêkûpêk e û gelek caran bi sembola kertî tê nîşankirin an jî bi teşeyekî jimarî li pişt kilîlka pêlekanê tê nîgarkirin.

**Jimara jorîn:** Dema muzîkî di her pîvanekê de digire dest.


**Jimara jêrîn:** Cureya nîşaneyan (yekpar, pileya reş, pileya spî…) digire dest û di xaneya muzîkê de dema wan diyar dike.

**Mînak:**


1. Terazûya $\frac{2}{4}$: Tê wateya 2 demên nîşaneya pileya reş (çarpar).



2. Terazûya $\frac{2}{2}$: Tê wateya 2 demên nîşaneya pileya spî (dupar).



3. Terazûya $\frac{2}{1}$: Tê wateya 2 demên nîşaneya pileya yekparê.



Wane 10


# TERAZÛYA MUZÎKÎ 2

Bi rêya tevgera dest, em van nîşaneyan pêk bînin:











❖ Li ser pêlekanê, ji her pîvanekê; ez 2 pîvanan binivîsim:




❖ Bixwînim, paşê vê rahênana solfayî bistrêm:






✓ **Têbînî:** **Terazûya çarlêdan** $\frac{4}{4}$ bi tîpa **"C"**`yê tê nîşankirin.

Wane 11

# KOMA MUZÎKÎ 1


❖ Ez û hevalên xwe bi hev re li van amûrên rîtmî bidin û bistrên:







# RAHÊNANA SOLFAYÎ 1


❖ Bi nîşaneya terazûya dulêdan; ez vê rahênanê bistrêm:




❖ Bi nîşaneya terazûya sêlêdan; ez vê rahênanê bistrêm:




❖ Bi nîşaneya terazûya çarlêdan; ez vê rahênanê bistrêm:



Wane 13

## PILEYÊN XALDAR

- Yekpara xaldar:

o. = 6 dem

- Dupara xaldar (pileya spî ya xaldar):

𝅗𝅥• = 3 dem

- Çarpara xaldar (pileya reş a xaldar):

♩• = 1.5 dem

**Têbînî:**

- Her xalek; nîv pileyê ji pileya li paş xwe dibe.
- Xal her tim li aliyê rastê yê pileyê tê nivîsandin.



𝅝. = 𝅗𝅥 + 𝅗𝅥 + 𝅗𝅥

$6 = 2 + 2 + 2$

𝅗𝅥. = 𝅗𝅥 + ♩

$3 = 2 + 1$

𝅗𝅥. = ♩ + ♩ + ♩

$3 = 1 + 1 + 1$

♩. = ♪ + ♪ + ♪

$1.5 = 0.5 + 0.5 + 0.5$


Wane 14

# RAHÊNANA SOLFAYÎ 2

❖ Ez vê rahênanê bixwînim û li pileyên xaldar, baldar bim:



❖ Ez ji nû ve rahênana li jor binivîsim û li sererastkirina terazûyê baldar bim:





Wane 15

# ARAM DÎKRAN



Aram Dîkran; hunermend û kesayeteke ermenî ye ku bi zimanê kurdî û ermenî dizanîbû û stranên xwe bi zimanê kurdî distra. Di sala **1934**`an li bajarê Qamişlo yê Rojavayê Kurdistanê jidayîk bûye.

Navê wî yê ermenî; Aram Melîkyan e.

Ji mêj de, dengê Aram û hestên wî di nava civaka Kurd de tê bihîstin û di nava gelê Kurd de kesê/a deng û hestên wî nebihîstiye, tune ne.

Piştî xwendina xwe ya navîn bi dawî dike, berê xwe dide fêrkirina muzîkê û bavê wî, ew han dida ku fêrî muzîka kurdî bibe û stranên xwe bi zimanê kurdî bistrê.

Di sala **1966**`an de berê xwe da Ermenistanê, di sala **1990**`î de berê xwe da Belcîkayê û her wiha jiyana xwe di nava gera li welatên Ewrûpayê de derbas kir û di **08.08.2009**`an li Atînayê koça xwe ya dawî kiriye.

**Hin stranên wî:**

1. Ay Dîlberê
2. Çiyayê Gabaro
3. Bilbilo
4. Hey lo lo delal
5. Şev çû
6. Ay dil

Wane 16

# STRANA BÛKÊ DELALÊ

- ❖ Li gorî noteya muzîkê, em bi hev re vê stranê bistrên:






Bûkê delalê rabe xwe kar ke
Cil û cihaza bi serê xwe da ke
Zava şîrîrn e xortekî pak e
Zava delal e xortekî pak e

Xemla wê bûkê xemleka zêr e
Bûk û zava xwe dane ber e
Bûk sipiye zava esmer e
Bûk sipiye zava esmer e

Bûkê delalê tu pir hêja yî
Şemamoka li nav merda yî
Tu pir şîrîn î tu pir hêja yî
Xewn û xeyala çavê zava yî

Gelêrî

Wane 17

## DABEŞKIRINA AMÛRÊN MUZÎKÊ

Em van amûrên li jêr dabeşî koman bikin û navê her yekê ji wan di koma wê de binivîsin:




| Amûrên têlî | Amûrên pifikî-bayî | Amûrên rîtmî |
| --- | --- | --- |
| | | |

Wane 18

# RAHÊNANA SOLFAYÎ 3

Ka em bi hev re, van rahênanan bi awayê solfayî bistrên:








Wane 19

# BIZIQ

Biziq; amûreke rîtmî ye ku gelek awaz li ser wê tên lêdan, di teşeyê xwe de mîna Ûdê ye, lê ew xwedî darekî dirêj e û gewdeyekî ji yê Ûdê biçûktir e.

Hejmara têlên wê di navbera **4**`an û **6**`an de ye, lê ji welatekî ta welatekî din ji hev cuda dibin.



Wane 20

## AMÛRÊN MUZÎKÎ

Di vê waneyê de, em ê cureyekî din ên amûrên muzîkê binasin:


- Amûreke têlî ye û di teşeya xwe de mîna kemanê ye, lê ne di rêya kevanê de tê lêdan; ew çi ye?

### ❖ Gîtar (Guitar):

Amûreke muzîkê ya têlî ye, têlên wê qutayî ne. Di rêya tilî yan jî mizrabê re tê lêdan.

Gîtar: Ji kodeke ku di jora wê de kuneke girover û fireh heye, bi zendekî dirêj ku di dawiya wî de 6 kilîlkên ku li her aliyekî 3`ê kilîlk hene, dest pê dike; karê van kilîlkan jî ew e: şidandin, rêkûpêkirin û zeftkirina têlên gîtarê ne.

Gelek cureyên gîtaran ku piraniya wan ji gîtara lasayî yan jî klasîkî hatine daraştin, hene.





Wane 21

## AWAZÊN MUZÎKÎ


- Awazên muzîkî; zimaneke ku ji **7** deng an jî tîpên muzîkî pêk tê û ji çep ber bi rastê ve tê xwendin:

**Do , Rê , Mî , Fa , Sol , La , Sî**

Ji "Do"`yê dest pê dibe û bê awaz û rîtm nayên xwendin.


Em "Do"`yê bi dengekî qalind dixwînin, "Rê" jî bi heman dengî lê hinekî xurtir, paşê "Mî"`yê bi dengekî bilinditir dixwînin û her wiha ta ku em digihêjin pileya "Sî"`yê.

Hemû cureyên awazên muzîkê, ji van dengan pêk tên.



# KOMA MUZÎKÎ 2

❖ Em vê rahênana li jêr bi stranên rîtmî bixwînin û rêkûpêkiya terazûyê di ber çavan re derbas bikin:



Wane 23

# MERYEM XAN



Meryem Xan: Yekemîn jina Kurd e ya ku bi zaravayaê kurmancî stran gotine. Di sala **1904**`an de li Şirnexê jidayîk bûye.

Ji ber ku ew jin bû û ji ber ku hunera kurdî jî gelek astengî û zorî dîtiye; ji ber vê jî bi nav û deng bûye û stran û hunera wê ta roja me ya îro tên bihîstin.


Meryem Xan; di sala **1949**`an de li Bexdayê koça xwe ya dawî kiriye.

Hin stranên wê:

1. Dotmam
2. Baran barî
3. Helîm
4. Weyla li min xerîbê
5. Yadê rebenê

Wane 24

# STRANA AYŞOKÊ




Ayşokê Ayşokê Ayşoka romanî
Şîrînê şemamokê destmala xortanî

Ayşokê çima çima Ayşoka romanî
Kevoka li nav genima destmala xortanî

Fîncana li dest mezina Ayşoka romanî
Dilkê min li cem te ma Ayşoka romanî

Ayşokê Ayşokê Ayşoka romanî
Şîrînê şemamokê destmala xortanî

Gelêrî

# JI FOLKLORA ME





# STRANA KEVOK IM




Ez kevok im lê lê lê lê…
Lê lim lê lê lê lim lê lê lê lê lê…
Ez kevok im way way ez kevok im qurbano
Ez kevoka şîn im way way kevoka şîn im qurbano
Li ser bana bin bana hûr datînim way way
Ez aşiqê lê lê lê lê…
Çavê şîn im way way çavê şîn im qurbano
Ez aşiqê lê lê lê çavê şîn im qurbano
Ez aşiqê lê lê lê çavê şîn im qurbano

Ez kevok im lê lê lê lê…
Ez kevok im way way ez kevok im qurbano
Kevoka reş im way way kevoka reş im qurbano
Li ser bana bin bana hûr dimeşim têm têm
Li ser bana bin bana hûr dimeşim têm têm
Ez aşiqê lê lê lê lê…
Ez aşiqê lê lê lê çavê reş im qurbano
Ez aşiqê lê lê lê çavê reş im qurbano

Folklor

# BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Meh | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Pileyên Muzîkî | Pileyên Muzîkî |
| Cotmeh | Pile û Teşeyên Muzîkî | Pile û Teşeyên Muzîkî | Noteya Muzîkî | Strana Kîroşkê |
| Mijdar | Xaneyên Muzîkê | Nîşaneyên Bêdengiyê | Strana Aylê Nûrê | Tenbûr |
| Berfanbar | Terazûya Muzîkî 1 | Terazûya Muzîkî 2 | Koma Muzîkî 1 | Rahênana Solfayî 1 |
| Rêbendan | Lêveger | Nirxandin | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | Pileyên Xaldar | Rahênana Solfayî 2 | Aram Dîkran | Strana Bûkê Delalê |
| Avdar | Dabeşkirina Amûrên Muzîkê | Biziq , Rahênana Solfayî 3 | Amûrên Muzîkî | Awazên Muzîkî |
| Cotan | Koma Muzîkî 2 | Meryem Xan | Strana Ayşokê | Ji Folklora Me |
| Gulan | Lêveger | Nirxandin | | |